## Tezmînata Mexdûrên Sûcan

Li Dakotaya Bakur destûr tê dayîn ku hin kesên diyar bi riya Tezmînata Mexdûrên Sûcan pere wergirin. Ev kes ev in:

- Mexdûrên bêguneh ku li Dakotaya Bakur yan jî li dereke ku li wirê bernameya tazmînatê tune ye û jê re lênêrîna bijîşkî divê, ji ber sûcekî tundiyê bi awayê fîzîkî yan jî derûnî birîndar bûne.
- Rûniştvanên Dakotaya Bakur ku li welatekî biyanî ji ber çalakiyên terorî birîndar bûne.
- Kesûkarên qurbaniyekî kuştinê.
- Kesên ku lêçûnên merasîma cenazê yan jî yên bijîşkî yên mexdûrekî kuştinê didin.

Ji bo wergirtina vî pereyî, divê ew kes vî sûcî di nav 96 saetan de ku ev çar roj e, ji hêzên ewlehiyê re ragihîne. Divê ew kes di nav salekê piştî ragihandina ji hêzên ewlekriyê re, serlêdanekê bike. Merceke din jî ev e ku ew kes di pêvajoya lêkolînkirin û girtina bersûc de alîkariyê bike. Nabe ku kesê dixwaze pere wergire alîkariya sûcekî birîndarkirinê kiribe yan jî wî bi xwe sûcekî wisa kiribe.

Kesek dikare ji bo tedawîkirina maqûl ya tibî û derûnî dermanên bi reçete pere wergire. Jidestdana mûçeyê, jidestdana xizmetên qerebûkirinê, lêçûnên cenazê, jidestdana aboriya kesûkaran hin riyên din in ji bo wergirtina pereyan. Lê belê, lîmîtên pereyê bê dayîn hene û ev lîmît wisa ne:

- Jidestdana mûçeyê nikare ji heftane 300,00$ zêdtir be.
- Lêçûnên cenazê bi 5.000,00$ hatine sînordarkirin.
- Tezmînat bi temamî nikare ji 25.000,00$ zêdetir be.

Pereyê Tezmînata Mexdûrên Sûcan tenê ji bo zirarên ku çavkaniyên din nadin, tê dayîn. Kesek dikare ji sîgorteya tenduristiyê, alîkariya tenduristiyê, Madicare, destûra nexweşiyê, destûra salane, ewlekariya civakî, tezmînata karkeran yan jî tezmînatên din yên kêmendamtiyê pere wergire. Heke kesekî ji van çavkaniyan pere wergirtibe, ew ê tenê ji bo zirara mayî pere wergire.

Hin caran kesek dikare ji sûcdarî tezmînat yan jî lêçûnên doza li dadgehê wergire. Heke tezmînat bê dayîn û wî kesî ji tezmînata mexdûrên sûcan pere wergirtibe, divê ew wî pereyî vegerîne. Heke ji aliyê dozeke dadgehê ve pere hatibe dayîn, dibe ku ji mexdûrê sûcî bê xwestin ku pereyê hatî dayîn vegerîne û heke pereyê ji aliyê doza dadgehê ve hatiye dayîn ji zirara aborî ya mexdûr zêdetir be, dibe ku serlêdan bê redkirin. Heke kesek dozeke hiqûqê veke, divê bernameya tezmînata mexdûrên sûcan nivîskî agahdar bike.

Ji bo jidestdan yan zirara milk tezmînat nayê dayîn.

Ji bo Serlêdaneke Tezmînata Mexdûrên Sûcan li ser virê bitikîne.



North Dakota Domestic & Sexual Violence Coalition

Projeyeke ji aliyê NDDSVC ve ji bo we hatiye pêşkêşkirin - Gulan 2020